***Flyer ‚Unterricht in der Herkunftssprache: Ein Gewinn!'*** *Übersetzung Kurdisch*

# Hîndekariya bi zimanê jê hatiye serkeftinek e!

Li malê derveyî elmanî hûn bi zimanên din dipeyivin? Xezîneyeke çiqas mezin e ji bo zaroka/ê we! Zarokên bi zimanê yekem baş dipeyivin, hêsantir elmanî û zimanên din ên biyanî fêr dibin.
Ji ber vê yekê hîndekariya HSKê ya zimanê zikmakî û çanda welêt ji bo zarokên we grîng e.
Zêdeyî 30 ziman li dibistanên Basel-Stadt û Basel-Landschaftê hene.

---

Kî zimanê destpêkê baş zanibe, zimanên din jî hêsantir hîn dibe. Lêkolînên zanyarî vê yekê şanî me didin û mamoste jî rojane vê yekê li dibistanê dijîn. Hîndekariya HSKê hîn zêdetir erêniyan bi xwe re tîne:

- Zarokên we hînî naskirina zarokên din ên bi heman zimanî dipeyivin dibin.
- Bi rêka zimên têkiliyê bi xizim û nasan re hêsantir dikarin deynin.
- Dikare hişê xwe bide ser welatê xwe û kêmtir bi xerîbiyê bihise.
- Çand û nirxên cudatir dijî.
- Bi asta xwe ya zanîna ziman serbilind dibe û dixwaze zimanên din jî hîn bibe.
- Pişt re ji bo pîşeyê jî erêniyekê bi xwe re tîne.

## Hîndekarî çi tîne?

Zarok û ciwan hîn dibin ku ziman baştir têbigihêjin, bipeyivin, bixwînin û binivîsin. Tecrubeya çandê digrin, li çîrokan guhdarî dikin, erdnîgarî, agahdariya hemwelatiyê, xwarin û vexwarin, şahî û rojên girîng hîn dibin. Mamosteyên perwerdekirî wan bi kêfxweşî hîn dikin.

## Çend caran û li ku hîndekarî pêk tê?

Hîndekarî di hefteyê de carekê li dibistanên vekirî, ger derfet hebe, li dibistaneke taxa ku zarokên we lê ne, yan jî cihekî nêzîkî we pêk tê. Balyozxane yan jî komeleyên têkildar vê xizmetê fînanse dikin. Wekî malbat bi pirahî hûn jî tibabekê didin.

## Çawa hûn dikarin zarokên xwe li malê li pêş bixin?

- Bi zarokên xwe re bi zimanê ku bi pirahî pê dihizirin û xeyalan dikin bipeyivin. Ger zarok bi elmanî bersiva we bide jî hûn bi zimanê xwe bidomînin.
- Kêfxweşiya zarokên xwe li zimên bînin. Ji wan re çîrokan vebêjin, lê guhdarî bikin û pê re stranan bêjin.
- Alavên bi zimanê xwe bidinê: Pirtûk, CD yên stran û çîrokan, ên fîlman.
- Destekê bidin danûsitendina wan a bi zarokên zimanê elmanî ango zimanên din dipeyivin.
- Bi mamosteyên dibistanê û yên kursên HSKê re têkilî û danûsitendinê xurt bikin.

---

## Serlêdana ji bo hîndekariya HSKê

Ji kerema xwe zarokên xwe rasterast li cem mamosteya/ê refa wî/wê bidin qeydkirin. Li kantona Basel-Stadt û Basel-Landschaftê niha zêdeyî 4000 zarok beşdarî hîndekariya HSKê dibin.

---

## Kantonale Kontaktadressen

Daniel Aeschbach
Erziehungsdepartement Basel-Stadt | Volksschulen
Fachstelle Pädagogische Unterstützung
Kohlenberg 27 | Postfach | 4001 Basel
Tel. +41 (0)61 267 90 08 | daniel.aeschbach@bs.ch
www.bs.ch/hsk

Bildungs-, Kultur- und Sportdirektion Kanton Basel-Landschaft
Amt für Volksschulen
Sekretariat
Munzachstrasse 25c, Postfach 616, 4410 Liestal
Tel. +41 (0)61 552 50 98, avs@bl.ch
www.hsk.bl.ch